

Çend gotin li ser rewşa Êzîdiya û bûyeren ku li şêxan qewimîna.

Ez jî wek êzîdiyekî xwe mecbur dibînim ku fikir û rahmanen xwe di derbara wan erîşen ku beriya çend hefta (15. -16.02.2007) Kurden misilman birin ser êzîdiyên Esifnê (Şêxan) binîm ziman.

Di serîda dixwazim bêjim ku armanca min û daxwaza min ne ewa ku êrîşan anjî rexna li olekê anjî qewmekî bikim. Ez jî xwazim fikirê xwe bi we hêjaya bidim xwendin.

Gelek nivîskar û rewşenbîran jî beriya min di derheqa vê yekêda fikrê xwe anîne ziman. Hin ji wan êzîdîna, lê beşa behtir ji wan ne êzîdîna û hinjê ne kurden jî. Cardinê jî wan wek dost, haval anjî naskiriyê êzîdiya xwe mecbûr dîtin, fikrê xwe û rexnê xwe eşkerê bikin. Ez ji wan ra pir sipas kim.

Dema ku ez bi wan êrîşan hisiyam, xemek giran ket dilê min û herza ez kirim bin bandore xwe. Min got qey ew 72 fermanên ku bêrê hatibune serên Êzîdiyan cardinê yek bi yek nûva li darî çavên min diqewimin. Min got qey tevahîya qêrîn û nalînên kûştî, birîndar, qebhetgerandî, talankirî û wan fermanên ku heta niha hatina serê êzîdiya bê navber di gûhê mindena.

Tenê bi saya şîretên dê, bav, kal û bapîrên me min karîbû sebir (teyax) bikim. Ewan herdem ji mera gotin:

“Sebir silameta.” anjî

“Xwediyê sebrê karê bibê milûkê misrê.”

Ev serpêhatiyên wiha merov bê zardikin. Nayên bahwerkirin ku ew ji aliyên van kesen ku ji ber zahmetî, zilm û zoriya desthelatdarên derdorên xwe de mana va çebûna.

Merov naxwazê bahwerbikê ku, ev êrîş ji layê kesên ku bi xwe mîna bav û kalên xwe bi sedê salan - belkî jî bi hezarê salan - buna hedefa ferman û qirkirinê pek hatiya.

Çawa dibe ku ev kes ji dîroka xwe ya tije xwîn û xwedî dijmintiyê fêr nebûna?

Gelo, gerek hêja çiqas kes bèn qetilkirin, da ku ew ji xwînrijandinê têrbibin?

Gelek caran ez û belkî gelek kesên dinjî mina min li bersiveke van pirsên min digerin û mirov tû bersivê nabîne.

Ez bahwerim sebaba ku herî sereke nezanî û hevdûn nenaskirina. Ew ji xeynî ola xwe pêve tu tiştekî dine ji olên din nizanin. Ji ber ku perwerda ola wan jî bi zimanekî dine, ew pê nizanin ku zanistiya wan ya di derheqê ola wan de jî gelekî kêma û çewta. Ewan gelek agahiyên çewt û ne rast di derbarê olên din bihîstiya û lewma jî bahwerin ku ola wan tenê ya herî raste. Merov karê bibêjê ku ew ji layê zanîna naveroka ola xwe û olên din de gelek cahilin. Ji ber ku tekiliyên wan bi hevra gelekî (pir) kêmin, ew hevdi nasnakin, nizanin bê mal û warên wan çiqas nezî hev û di nava hevdene û bi hevra şîrkê dîrokekê na ku bingeha Medenî bûna tevahiya dinyayê (Cihanê) ya.

Mezopotamiya

Her çiqas bi hezara kesên zane û pispor di derheqa vê herema ku wek dergûşa medeniyetê tê naskirin û cihê xwe î qedîm di diroka dinya yê da ferzkiriyê dinivîsinin jî, hêjî negîştina destpêka wê. Hejî kes nikarê bêjê wê jîyana medenî ji kengîva û ji layê keva dest pe kiriya. Lê

gava merov berê xwe bide ol û netewên ku îro di vê herêmê da dijin (Êzdahî = Êzîdî, Cûhû, Mesîhî, Zerdeştî û Islam) binêre, merov dibîne ku destpêka tevan dahira. Lê, ya Êzdahiyê (Êzîdîtiyê) bitenê ne dahira. Ji temaman tenê dîroka Êzîdiyan mina dîroka Mezopotamiya yê weke bahra bê binî kura û dirêja. Hemû olê din heryek bi pexemberekîva girêdayîna û despêka wan jî bi demjiyana pexemberê xwe va girêdayiya. Tenê Êzdahîti ne bi pexember û beşeriyetê va girêdayiya û lewma ez karim bêjim ku rasta ew ji dema hebûna yek Xweda û Tawisî Melekva heya û belkî Medenyeta Mezopotamiya ji wan dest pê kiriya.

Gelo hinek dikarin vê texmîna min bi tezbît (bi delîla) înkâr bikin?

Anjî ew kesên ku ji vê texmîna min bahwernakin, dikarin bi tezbît bibêjin, ka vê olê ji kengîva û ji layê keva dest pekiriya?

Ez dibêjim ji ber kahniya dîroka ola Êzdahîtiyê Mezopotamiya yeka lewma ew bingeha hemû olê din kû îro tên naskirina. Lewma dîroka wê jî mina dîroka Mezopotamiya yê nayê tezbîtîkirin.

Gelo hinek dikarin vê gotina min bi delîla talanbikin û bejin nerasta?

Çima ez di vê bahweriyê dema kû ola Êzdahîtiyê ji awilda li vê heremê ya?

Bê guman, nivîsîna herî kevin ku li vê heremê hatiya dîtin ya li ser jîyana “Gilgamêşa”. Gava merov vê nivîsînê bixwînê, yekê bibêjê qey ev nivîsîn li ser oldarekî Êzîdî hatiya nivîsîn. Wexta ew dûha xwe dike, evarê berê xwe di de rojava û sibehê berê xwe dê rojhilat, haynî wek Êzdahîtiya îro ye.

Ji dema awil û heta dema me ya îro gelek netew min tavên bihara kişehana ser vê herema pîroz û ew bi zorê kirina bin hikmê xwe û hevdi bedilandina. Ev rewş heta îrojî berdewama. Gelek netewan ol û adetên xwe bi xwera anîna vê heremê û bi qedandina hikmê wanra ol û adetê wanjî ji bi carekê hilatina. Bi tenê Êzdahî ji destpekê va di wirda buya perçak ji vê heremê û heta niha, bedîl bi bedîl nujenbuya û nehatiya qelandin. Êzdahî perçak ji xwezaya wî cihî û wê heremêya. Gelek netewan mina delxa fêkî şax ji we ji xwera birina û kirina riknê asafî, li ser dijin lê koka wê di cihê xwe da maya û ticara nayê qelandin.

Heta ji destê kesê diz bê, ewê xwediyê malê ku wî diziya tine bike, da ew ti cara derfeta naskirina male xwe bi dest nexê.

Bê goman, gelek netewan ax û kultura Êzdahiyê dizîna, lê bahra behtir bi dare zorê ji wan standina. Lawma jî gelek dijminên wan çebûna û hena. Yek ji van netewa di dema me ya îroda netewa eraba ya. Ola îslamê ji sala 620`ta û wirda peyda buya û ew ciwantir ji hemû olê din li vê heremêya. Lewma ew bê nahber dijmintiya hemû olê berî xwe dikin û dixwazin wan bi carekê biqelînin. Ji wan bê nahêlin piştî wan ti olê dinjî peyda bibin. Ola mesîhiya jî mina wan şerê cihûya û olê din yê beriya xwe kiriya. Ola cihuya jî mînaka herdokê dina. Van hersê olan gelek olê din bi carekê ji hole hilanîna û ew di nava xweda qelandina. Bi tenê Ola Êzdayî maya û hejî wek gûleke di nava Mezopotamiya da geşa. Van hersê olên îro di **Mezopotamiya** hikimdar ev herem ji biheştê gûhertin cahnemê. Ji hindikahî bi destpêka afirandina îslamê va heta îro bê nahber Cihû, Mesîhî û Misilman di vê heremê da hemberî hevdu şerdikin.

Belkî di bin hikmê ola mesîhiya da behtîrî hemû olê din beşer hatina kuştin. Lê dîsa navê îslamê di vê dahwêda behtir belav buya. Lawma ezê bahra behtir bala xwe bidim vê olê.

Islam

Ji dema ku Mihemed ê lawê Abdullah (silavê Xwedê li serbin) ola îslamê ji sala 620'ta û peda di nava netewa eraba da afirandiyê, wî fersetek gelek mezin kir destê netewa xwe û reya hikmekî pir berferêh da ber wan. Netewa erab jî ev ferset baş naskir û ew gihand armanca wê. Malûma ji ber ku rîknê ola Islamê ne peydabunek nû bû û ew bi hezarê sala ji layê netewê din va dihat bi karanîn, lawma Mihemed bi bahwermende xwe baş da fahmkirin kû li wan ferza ku bi şer jî bê nehelin carek din ev ferset ji destê wan derkevê. Fikrê “yek Xweda” fikrekî pir kevnara dîrokiya. Ev fakir anjî bahwerî beriya Mihemed bi hezarê salan di nava gelek netewada di hat hebandin. Herî behtir ji layê Êzîdiya va dihat bahwerkirin. Mihemed zanîbû heta xwediyê kahniya vê bahweriyê neyen qelandin, netewa wî jî nikarê rihet hikmê xwe li ser tevahiya cihanê ferz bike. Lewma wî li ser tevahiya islamê ferz kir, ta ew herdem û li her cihî şerê “cîhadê” bikin, heta ew hemi gel û netewê li ser rûye vê cihanê (dinyayê) dijin bi dare zorê jî bê bînin ser fikrê xwe û bi vî hawayî bikin bin hikmê netewa erab.

Wexta hezê Îslamê êrîş birin ser netewê derdorê xwe û ola wan, hineka ji wan zu fahmkirin kû ew li hemberî wan bi sernakevin. Lawma wan nave îslamê li ser xwe qebûl kirin. Yek ji wan netewa Farisa ya û ya dinjî êşîra Osman ê Tirk bû. Êşîra osman kû du Bavikê koçer bûn (ew bi navê “Akkoyunlu” =Xwediyê Mihê sipî û “Karakoyunlu” = xwediyê mihê reş jî ten naskirin). Netewa Farisa û Heşîra Osman li ser asasê îslamê ne sekinîn û wan Îslam li gorî berjewendiyên xwe gûhertin û ji xwera wek çek bi karanîn. Lawma ew bûn hikimdar û bi teybetî Osaman hewqas bi ser ket. Heşîra Osman herçiqasî ne ji we heremê jî bûn wan dîsa karîbun di demek pir kinda tevahîya rojhilata navîn, beşek ji Awrûpa û Afrîka bikin bin hikmê xwe (ew ji sala 1301 heta 1918 li ser hikim man) ji berkû wan Ola Îslamê ji xwera bi karanîn. Ki karê bêjê Îslametî ya iranê û ya Tûrkiyê wek heva anjî wek ya nava erabê Sihûdiyê na? Gava merov bahla xwe baş bide wan û wan ji hev cûda binirxînê wê gelek aşkere bibînê ku di praktîkê da ti wekhevî di nava wanda nina û heryekî ji wan îsalam li gorî berjewendiyên xwe gûhertiya.

Bî tenê netewa Kurda ev fersend nedîtî û bi karnanîn. Ji berkû wan ne bi raya xwe Islam li ser xwe qebûl kirin. Islamê ew bi dare zorê kirin bin kontrolla (hikmê) xwe. Lewma wan nikarîbû wek Farisa anjî wek Osmaniyan bi serkevin. Merov karê îrojî binaşa ola Kurdan ya berê bibînê.

Ez dikarim nimûnakê bidim:

Di nava Kurdan da çarçefkirina jinika (pîreka) û destjekirina diza ne hedetin. Gelek tezbît (defîl) hena kû ola Kurda ya berê sereka Êzdayî (Êzîdî) bû. Heta niha jî bav û kalên Êzîdiya gelek êşîrên Kurdan binavkin kû ne ji mej va misilman bûna. Her çiqas dem û wext bûhirin, hewqasî jî agahiyên Kurdan di derbara ola wan ya asîl (resen) ji kêmdibin. Nexasim ji dema kû Êzîdî jî ji ber zilm û zordestiya ku li ser wan bê nahber domîne û diwartir bê neçar mana cih û wahren xwe bi carekê terkbikin.

Merov karê van numûnê bi vî hawayî berdewam bike û ew nayan bi dawî kirin. Ez dîsa mecbûrim ku nivîsîna xwe bi dawî bînim.

Mîna bav û kalên me jî gotina: *“Zikê zaroka tiji gotina lê devê wan na gerihê bi axivin.”*

Heta niha gelê Kurd bi hijmara xwe gelê herî mezina û bi heza ku ji her warîva ji dîroka dinyayê (cihanê) mahrum û bê pahr maya. Îro ew gihana qûnaxekê nûh. Aw gihana diryanêkê kû du rê jê çin.

- Reyek jê reya Îslama dijiwara. Ew kesê vê rê ji xwera hîlbijêrin jîyana wan wê tim yekrengbê û ew ti cara bê şer û dijmintî nameşê. Azadiya fakir û ramanê hîç nina anjî ve pir kembê.
- Reya din reya lîberala. Herkes, be cudahiya ol û netewa xwe, karê di vê reda bigihê mirazê xwe î aşîtî û di nava çand û hûnerk pir zengîn û dewlemenda bijî. Herkes karê li ser fikrê xwe û ramana xwe azad bijî.

Îro çavê her kesê ku ji berê dayikek Kurd şîr metibê lî wî cihê pîroza û ji herdemê behtir bi heviyen giran li benda jiyaneke bi tundî azadî û serbixwena. Lawma vê êrîşê reactionek hewqas berfereh afirand û dilê Êzîdîyan û ne Êzîdîyan eşand. Gerek ti cara derfet neyen dayin kû ev eşqa ketiya dilê netewa Kurd carek din xemsar bibê.

Gereka her kurdek ji xwe bipirsê gelo Kurdistan bê ola Êzdayî (Êzîdiya) û çand, huner û ziyaretê wan we çawa bê?. Ka di Kurdistanê da cih warê ji Lalişa nuranî pîroztir û qedîmtir kûjana? Cihan (Dinya) îro Kurdistanê herî behtir bi çi naskê?

Êzdayî ne bi tenê aslê Kurdaya, ew heta hetayê xemla wî cihê pîroza. Gelek cara siyasetmedar û rewşenbîrên Kurdan bêjin Êzîdî kurden resenin anjî koka kurdana.

Gelo çêdibê ku merov agir li ser koka xwe dabitê û koka xwe biqelînê?

Ez bi zimanekî aşkere û zelal dibêjim: Ew war anjî dewleta ku Êzîdî bi her hawayî va teda ne azad bin, çênbê nave wê bibê Kurdistan. Navê Kurdistanê li wî warî pîroza ê ku ola Êzdayî bi tevahiya çand, kultur û hemû hed û sedê xwe têda parastî û azad be.

Banga min ji Êzîdiyara eva:

Herkes zanê dost û dijminên wan kîna. Dijminê me ji bav û kalada eşkerena. Wan herdem gotiya “em dijminê we na”. Lewma em nikarin bêjin ew bêbextin. Dijminê eşkere ji dostê nerast û bêbext pir baştira. Gerek em ticara rê nedin xernexwazên xwe yên kû me berdin hev. Gerek em bi tûndî ji wan mijarê bê encam berdin. Ti cara em ji bîrnekin bav û kalên me di bin kijan şerd û zahmetiyanda dijîyan û dîsa serê xwe netewandin û kahniya xwe ya asîl dev ti kesîva bernedan. Ez aşkere dibêjim, sebaba gelek astengiya ku em îro têdena, em bi xwena.

Bi teybetî banga min ji wan kêsê ku bi çavekî reşenbîrî li xwe niherin ra haya:

Gerek herkes hed û sedê xwe zanibê. Rewşenbîrî ne ewa ku ez zanim çend gotina binivîsim. Rewşenbîrî bi raya min bi tenê di virda te naskirin, gava merov karibê berê civakekê anjî Netewekê anjî herî kêmalbatekê ji ser rêya xerab vegehinê. Rewşenbîrî, ewa kû merov kemasiyê civakekê serast bike. Rewşenbîrî ewe gava merov karibê şera wergerînê aştiyê. Ez bahwerim ku di dema ma îroda bitenê herdo serokê ola me, Xwedê û Tawisî Melek ji wan razî bin! Mîr Tahsin Beg û Bavê Şêx, Şêx Xeto karin bejin em reşenbîrên. Ji ber ku wan ji herkesî behtir zirar ji destê wan êrîşkeran dîn û dîsa rê nedan tikesî ku bûyerê hê ferehtir bikin û xwînê birjînin. Gelo kê karîbû ji wan baştir di rewşek wiha nazik û tengda çekê hewqas kesê dil bi kin ji zikê hev derê xê û nehêlê xwîn birijê?

Bi nerîna min, ev nîşanan li serê hemû şerden rewşenbîriye ya. Ne bi tenê em wek Êzîdiya herkesê ku bi vê buyerê hisiyane zanin ku herdo camêrê Xwedê jê razî layîqê navê xwe û hikmê ku Xwedê dayî wanin. Em îro bi wan pir serbilindin. Xwedê û Tawisî Melek wan û kesên mîna wan ji serê me kêmnekin. Ez wan kesên ku van herdû Xwedê jê raziyan rexne dikin, bi tûndî şermezar dikim.

Golo dawiya hertiştî heya lê dawiya eş û jana Êzîdiya bi tenê nina?

Gava min xwest vê nivîsîna xwe bi dawî bînim xeberek din hê ji ya buhirî reştir û xemgîntir gihîşt min û dilê min jî bi dilê dostê Merovahiyê û Medeniyetê ra dîsa pir xemgîn kir. Min nuh bihîst ku 23 kesê Êzîdî ji Başîk û Bahzanê bi testê terroristê bextreş hatina kûstin. Ez vê kûştinê bi tundî şermezar kim û sersaxiya xizm û Malbata kesen hatina kûştin xwazim. Rahma Xwedê li kesê hatina kûstin bê û cihê wan biheştbê.

Almanya, 23.04.2007

Silav û rêz ji hemû xwendevan û guhdaran ra

Ji layê birayê we
Ferhun Kurt